Nawisk

Ma raste me têkstê xwemalî tune ye?

Tehsîn Navişkî

Pirsyara li serî me kiriye manşêtê mijarê vê carê, piraniya caran bînêrin dirama û şanoyên (tiyatroyên) me yên hindurî aresteyî hevdu dikin; çaxê karên tv. yên me yên diramî dibînin û diçine holên nîşandana şanogeriyên me û temaşe dikin ku piraniya têkistên dibine karên diramî û karên şanoyê û ekterên me li ser depê şanoyê pê dileyizin ku giyanê wanan giyanê têkistên biyanîne û bibe dîkor û eksesuwarên kurdî hatine xemilandin.

Raste dibînin, caran têkistê biyanî bi navê têkistekê wergêrayî propagenda jê re dihê kirin. Lê çaxê temaşevan li ser depê şanoyê bûyerên wî zindî dibîne, jê re eşkera dibe mafê nivîskarê resen yê wê têkistî hatiye xwarin. Ji ber ku wergêrî û derhînerî, bêyî destûriyê ji nivîskarê têkistê werbigirin, hatîne têkistekê din; li pey nêrîna xwe, li ser têkistê wî ava kiriye û bi navê wergêranê û berhevkirinê kiriye karekê hunerî yê tu kesan temaşe nekirî?!

Ez dibêjme van kesan: Heger her hûn hatin û we bi navê têkistê biyanî, têkistekê din li ber wî têkisitî we ji riyalistê xwe çêkir û çeteneke mezin we jê re bir. Çima hûn nahên, mijarê heman têkisitî; her bi navê xwe, yan bi navê nivîskarekê din yê ku hûn di gel de rêk dikevin bi wî karî radibit, bi şêwazê xwe yê taybet, yê ku ji forme û naverokekên kurdî pêkhatî binivîse? Yan bo çi dê navê wergêranê danine ser

têkistê we û giropê karî li pey nêrîna xwe duristkirî?

Bi nêrîna min ya qenctir ew e; her têkistekê bi vî rengî dihê nimayişkirin, dê baştirbit, derhêner û wergêr bi hev re bigehine biryarekê ku wî têkistî bi navê wergêranê belav nekin. Evca bi çi navê din bit; li wî çaxî, ew wê bibite helbijartina wanan. Nabite arîşe; li wî çaxî, bi navî berhevkirinbe, yan hizir jê wergirtinbe (aqtbas) be; mîna birayên me yên ereb dibêjin. Ya giring bi navê wergêranê nebe. Ji ber ku wergêran dûr e ji bûyerên wî karê hunerî yê bi wî navî hatiye belavkirin û li ser navî şanoya me dihê tomarkirin.

Ji layekê din, erê ber aqile me têkistê xwemalî nebe û em biçin li têkistên biyanî bigerîn û wê zehmetê pê ve dibîn û di wergêrîn û berhev dikîn; heya ji nû karekê hunerî jê durist dikin û pêşkêşî temaşevanê xwe dikin?! Bi nêrîna min ew çeten û sergêjiya bi têkistekê biyanî ve dibîn, em bi têkistekê xwemalî ve bibin, sererayî hemû kêm û kasî û arîşeyên dikevne di rêka me de, dibit em dê têkistekê ciwantir û pitir bi riyalistê me ve besitî bi dest xwe êxin.

Dibit ew birêzên di biyavê dirama û tiyatroyê de kar dikin, wilo têbigehin û bersivê ji me re bidin: Me têkistê xwemalî tuneye; vêca emê çawa bi vî karî rabin? Raste dibe me ew têkistê xwemalî yê li astê cîhanî nebin. Lê bi dîtina min, heger me têkistên wêjeyî yên li astê têkistên cîhanî yan herêmî nebin, misoger me derhêner û ekterên li astê derhêner û ekterên cîhanî jî nabin.

Raste dibe me nûke têkistê xwemalî yê durist nebe, êkser bikine karekê şanoyê (tiyatroyê) yan karekê diramî û li bajêrên herêmê nimayişkin. Lê min baweriya ya hey, me ew çîrok û roman û dibit têkistên şanoyê bi xwe jî, nûke me li herêmê hene; heger zehmet hindî wan têkistên biyanî yên wergêray pêve bihê birin, dibit têkistekê hunerîtir û nêzîktirê ji jiyana derhêner û ekteran jê derkeve û dûr nîne, êdî ew biyanî bihên ji xwe re wergêrin û mifay jê werbigirin.

Lê mixabin ev destpêşxeriye zû bi zû li cem şanovanên me peyda nabe. Her dem di hemû biyavên jiyarê de me girêka xwekêmdîtinê heye û piraniya caran tiştên xelkekê din li ber me bi bihane û yên xwemalî li ber me bê bihane û bi kêr nahên da ku em sûdê jê werbigirin!

Bi nêrîna min hindî em xwedanên xwe vê reftara nerênî bin û kar û tiştên biyaniyan li cem me hemû tiştbin, emê her wê bimînîne li dawiyê û çavê me dê li ber destê xelkekê din be û bi zehmet em bikevîne dixana vêregehiştina pêvajoya çand û hunerê cîhanî de.